

Dem dema çalakîyê ye!

Ji bo Ewlehiya Civakî, Aşitî ûd Edaleta Avhewayê

Bernameya biçûk a hilbijartinê 2021

DIE LINKE.

Kurdische Fassung

Ji bo Ewlehiya Civakî, Aşitî û Edaleta Avhewayê

Di vê hilbijartina parlamentoya federal de biryar li ser van yekan tê standin: Kî heqê lêçûnên ji ber krîza koronayê dide? Ji bo filitandina avhewayê divê em pergala aborî û civakî ji nû ve saz bikin. Jiyana kê dê hêsantir be û kî dê bikeve nav zehmetiyan? DIE LINKE dixebite, da ku tu kes mecbûr nemîne, ku di navbera karê xwe û zarok û neviyên xwe de biryarekê bistîne. Girêdana parastina avhewayê bi hebûna karên ewle û meşaên baş ve: Ev yek pêkan e. Pergaleke tenduristiyê ku di krîzan de têk naçe û heman xizmetî dide her kesî/ê: Ev yek pêkan e. Meaşên, ku têra jiyaneke baş û teqewîta ewle dikin: Ev yek pêkan e. Dewleteke sosyal, ku teqez her kesî/ê ji belengaziyê diparêze û perwerdehiya baş, xaniyên bi kirêyên maqûl, çûnûhatina li navbajêr ya bê pere pêk bîne: Ev yek pêkan e. Gava her kes keda xwe ya adilane bide. Kesên super-dewlemend di dema krîza koronayê de hêj dewlemendtir bûne, lê belê di heman demê de gelek xebatkarên di xebata-kêmdemî de nanoziko debara xwe kiriye. Têra her kesî/ê pere heye. Divê pere bi awayekî adilane were parvekirin û ji bo başiya tevahiya gel were bikaranîn. Ev yek pêkan e, bi LINKEya xurt re. Ji ber vê yekê em di hilbijartina 26ê Îlonê ya parlamentoya federal de talibê dengê we ne!

Em xebatê saz dikin, da ku li gorî jiyana we be
Kesek ji pênc kesên li rojava, kesek ji sê kesên li rojhilatê Almanyayê bi kêm-meaşê dixebite: Tenê

bûyerek – xebata kê-m-demî, nexweşî, endamên malbatê yên bi pêdiviya lînêrînê – tirsê parastina hebûnê dixê dilê wan. Korona vê tirsê xiste dilê gelek kesan. Divê meaş bilind bibin. Em kêmtirîn-meaşê dikin 13 Euro – jê kêmtir têra teqewîta bê xizanî nake. Kî bi hevpeymanan kar a demkî de, di karê demkî de, li gel fîrmayên sîmsarên xebatkarên an jî fîrmayên navbeynkar, di Minijob de yan jî bêyî Hevpeymanan Hevbeş bixebite, ew kêmtir qezenc dike û ewlehiya wî xirabtir e. Em dibêjin: Êdî bes e! Di şûna xebata ne ewle û kê-m-meaşan de divê her kes di Hevpeymanên Hevbeş de cî bigirin. Bi hev re em bi hêz in! Karker û sendîqeyên wan dê bêhtir bibin xwedî mafê biryardanê û mafê vetoyê yê li ser guhertina navendan û jikardexistinê. Em karên wisa ava dikin, ku em bikaribin bi riya wan plana siberojê bikin. Ji bo malbat, heval û dema vala pêdiviya me bi demê heye: Demên xebatê yên kurt û meaşên sererastkirî yên kamil.

Em dewlemendiyê wisa parve dikin, ku kêrî her kesî/ê were

Li Almanyayê dahatû û dewlemendî hîç wisa ne-wekhev par nebûbûn: Tenê 45 malbatên herî dewlemend bi qasî nivê fêqîr ê tevahiya gel xwedî mal û milk in. Ji ber ku xerxa li ser dewlemendî û dahatûya bilind kê-m bûne. Ji 1997an ve êdî xerxa dewlemendiyê nayê standin. Encam: Di xizmetên ji bo tevahiya gel de bi awayekî bê hed tasarûf tê kirin an jî ew xizmet hatine xwemalîkirin. Li gelek dibistanan tiwalet naxebitin, ji xwe ne hewce ye em

qala nebûna laptopan bikin. Nexweşxane tîn xwemalîkirin an jî girtin. Pêdivî bi gelek mamosteyên dibistan û hêlînên zarokan heye. Ji bo vê yekê pere tune ye? Helbet heye: Em ê xerca dewlemendiyên bilind û mîrasan bi awayekî adilane bigirin. Bi riya vê dahatûyê em ê dibistan û nexweşxaneyan modernîze bikin û di malê giştî de xaniyên bi kirêyên maqûl pêk bînin. Çimkî çî tişt ji bo her kesî/ê hebe, divê ew tişt ê her kesî/ê be jî.

Sonda me ya li ser xercê: Kî (wekî ezê, Koma-Xercê I) serê mehê kêmtirî 6.500 Euro brutto qezenc bike, ew kes dê kêmtir xerc bide. Zêdetir bikeve destê kê, ew kes dê bêhtir bide. Em jî tiştêkî zêde naxwazin.

Em derbasbûnên adilane yên bo siberojeke li gorî pêdiviyên avhewayê pêk tînin

Ji sisêyan duduyê Qirêjiya CO₂ ya tevahiya cîhanê ji aliyê 100 komşîrketên mezin ve tê kirin. Ji ber vê yekê em ê hesabê ji bo parastineke hevgerî ya avhewayê ne ji mirovên ji rêzê bistînin, ne ku bi riya kirêyên zêde yan jî bilindkirina heqê elektrîkê. Lê belê berevajiyê vê! Em bela xwe didin komşîrketan û hewl didin ku derbasbûneke adilane ya ji bo siberojeke li gorî avhewayê pêk were. Em ji bo karkeran sîwaneke rizgarkirinê saz dikin: Bi riya garantiyên kar û dahatûyê. Bi riya xebata hefteyê 4 rojan, hevsengiya meaşan û garantiya perwerdeya xwepêşvebirinê.

Em otobus û trênan berfirehtir dikin û çûnûhatina li navbajêr dikin bê pere. Gava pêşî: rêwîtiya bê pere ji bo zarok û kal û pîran. Di nav pênc salan de divê li her derê Almaniyayê otobus û trênan bê heq bin. Ji bo gund û qezayan em garantiya mobîlbûnê didin: Bêhtir otobusên, ku zêdetir diçin û tîn. Ji ber dûrbûna ciyê kar kî mecbûr be her roj here û were, nabe ku ew mecbûrî erebeyê be. Em buhayên çûnûhatina bi trênan dikin nivheq û çûnûhatina riya kurt a bi balafirê vedigerînin ser rayên trênan. Bêhtir hatûçûya bi riya trênan di heman demê de tê wateya: hilberîna bêhtir û derfetên xebatê yê bêhtir. Hete 2035an em ê rêveberiyên herêmî, aborî û civakê bikin klîma-notir.

Em lînêrîn û tenduristiyê wisa rêxistin dikin, ku her kes bi qasî hev baş xizmetê bibînin

Di dawiyê de koronayê nîşanî me da: Pergala me ya tenduristiyê ne li gorî krîzan e. Li nexweşxane û navendên lînêrînê xebatkar kêmtir – herî kêmtir 100 000 serê her du beşan. Li her derê xebatkarên lînêrînê hewl didin, ku ciyên vala bi riya xebata zêdetir dagirin. Pîrî caran ji bêhtirî hêza xwe. Gelek kes bi awayekî perîşanbûyî dev ji kar berdidin. Êdî em ji rewşa awarte ya lînêrînê derkevin! Em lînêrîna baş ya bi riya hejmara pêwîst a xebatkaran bi awayekî qanûnî diyar dikin. Şertên çêtir yê xebatê û serê mehê 500 Euro bêhtir: Kî hay ji mirovan hebe, mafê wî/ê ne kêmtirî yê wan kesan e,

ku pereyan bi rê ve dibin an jî bazirganiyê bi hîsseyan dikin! Divê komşîrketên nexweşxane û lînêrînan ji bo başiya tevahiya gel bixbitin, lê ne ji bo qezenca zêde û dabeşkirinê! Em nexweşxane û navendên lînêrînê dixin destê malê giştî û bo başiya gel. Êdî bes e ji tibba-çîna-Zemîn re: Yekser lînêrîneke baş ji bo her kesê xwedî sîgortayê tenduristiyê ya hevgerî: Her kes, her wisa kesên xwedî qezenca herî zêde pere didin qaseya tenduristiyê ya qanûnî. Heqê mehane ji bo her kesî/ê kêmtir dibe. Kî ji 6.300 Euro brutto kêmtir qezenc bike, ew dê ji niha kêmtir pere bide. Sîgortaya Giştî ya Lînêrînê ya LINKEYê hemû pêdiviyên di nav xwe de diheve. Lêçûna xweser tê betalkirin, ku ji aliyê kesên xizmeta lînêrînê dibînin ve tê razandin.

Pêşî mirov paşê qezenc:

Em kirêyên xaniyan maqûl dikin

Kirê gelek bilind dibin, û ne tenê li bajarên mezin. Mirov her û her beşeke mezintir a meaşê xwe dide kirêyê. Gelek mirov neçar dimînin, ku ji taxa xwe derkevin an jî di daîreyeke gelek biçûk de asê bimînin. Ji ber ku li ser emlaqan spekulasyon heye û kirêdar heqê qezenca xwediyên hîsseyan didin. Hikûmet vê pêşveçûnê nesekinand. Êdî bes e jê re! Em gelek bilindbûna kirêyan disekinandin û ji bo kirêyan jorsînoren diyar saz dikin: Dorbisînorkirina kirêyan! Nabe ku modernîzekirin ji bo bilindkirina kirêyan were bikaranîn. Em xerca modernîzekirinê radikin. Êdî nabe ku mirov bi riya xaniyan li ser borsayê spekulasyonan bike. Divê ew komşîrket dîsa bibin malê giştî, ku xanî nû nakin, kirêyan her bilindtir dikin an jî zorê didin kirêdarên xwe. Bazar vê yekê sererast nake: Hejmara xaniyên sosyal êdî bûne tenê bi qasî nivê beriya 15 salan. Bêhtirî pênc mîlyon daîreye kêmtir in, ku pêdiviya mirovên kêmtir pere qezenc dikin pê heye. Em li dijî vê yekê disekinandin: Her sal em ê 250 000 xaniyên din ên sosyal pêk bînin. Ew ê bi awayekî domdar girêdayî civakê bin.

Em teqewîtan wisa pêk tînin, ku di pîr û kalbûnê de jiyaneke baş pêkan dike.

Gelek mirov bi xemxurî li ser teqewîta xwe difikirin: Ew ê têra debara jiyana wan bike – û ew jiyana dê çawa be? Heqê teqewîte karê min dê di destê min de bimîne yan jî meaşê teqewîta dê bê qutkirin? Kardêr û partiyên, ku nêzîkî wan in, dixwazin, ku mirov demdirêjtir bixebitin: hete 68 yan jî 70 salî. Ev yek dê ji bo gelek kesan were wateya: Hete hûn bikevin, divê hûn bixebitin. DIE LINKE dixwaze, ku her kes bikaribe herî dereng 65 salî teqewît bibe. Kê 40 salan heqê xwe yê mehane razandibe, divê ew bikaribe hêj zûtir teqewît bibe. Em ê rêjeya teqewîte dîsa bilind bikin û bigihînin 53%an (ji 48%an). Kî îro

kêmezêde bi qasî 1050 Euro digire, ew dê 100 Euro zêdetir bigire. Em dixwazin sîgortaya teqewîtê wisa saz bikin, ku her wisa memûr, siyasetvan û xebatkarên serbixwe jî heq bidin û sîgortaya wan jî hebe. Bi vî awayî ev yek dê têra teqewîteke baş a ji bo her kesî/ê bike. Divê meaşên teqewîtê yên li rojhilat demildest li gorî yên li rojava werin eyarkirin. Di şûna berhevkirina şûşeyan de: Em ê meaşên teqewîtê yên nizm zêde bikin û bigihînin 1.200 Euroyan. Ev yek tenê adilane ye.

Li ser miriyan bazirganî nayê kirin: Îxrackirina çekan qedexe bikin

Ji Almanyayê çek û malzemeyên çekan ji bo tevahiya cîhanê tînin firotin – her wisa ji bo wan deveran, ku bi riya van çekan mafên mirovan tînin binpêkirin, şerên navxweyî û şer tînin gurkirin. Çekên almanan di şerên li Sûriye û Yemenê de tînin bikaranîn. Bi riya van çekan mirov tînin birîndarkirin, bi zorê tînin koçberkirin û tînin kuştin. Sonda hikûmetê, ku digot em ê van yekan dijiwartir kontrol bikin, hîç pêk nehat: Hêj jî Almaniya di rêza 4an a Şampiyonên Îxrackirina Çekan de ye. Û îxrackirina çekan bêhtir dibe. Pîraniya gel li dijî vê yekê ye. Dêrên mezin û gelek înfîyatîvên hemwelatîyan ên li Almanyayê dixwazin hikûmet ji vê yekê yekser vegere. Lêçûnên ji ber çekdarbûnê zêdetir dibin. Em dibêjin: Ev riya şaş e! DIE LINKE ji bo aşitiyê têdikoşe. Em Parastina Federal ji erkên li derveyî welêt vedigerînin. Em ê îxrackirina çek û malzemeyên çekan qedexe bikin.

Em dewleta sosyal teqez dikin

Almaniya yek ji dewletên herî dewlemend ên cîhanê ye. Divê li vê derê tu kes di nav xizaniyê de neji. Divê tu dayika bê kar mecbûr nemîne, ku ji xwarinê teserûfê bike, da ku bikaribe ji zarokê/a xwe re çenteyekî nû bikire. Kî bê kar be, divê mecbûr nemîne ku bikeve nav xizanî û Hartz-IVê. Divê Pereyê Bê Karan I demeke dirêjtir were razandin. Heqê ji Hartz-IVê xizaniya bi riya qanûnan e û têra xwarina maqûl nake. Raporeke pisporan a ji aliyê hikûmetê ve vê yekê diyar kir. Em dixwazin di şûna vê yekê de Kêmtirîn Ewlehiya bi qasî 1.200 Euroyan bixin meriyetê, ku nikare were qutkirin („bê ceza“). Hinek beşên dewleta sosyal xizmetên baş yên ji bo civakê ne, ku ji bo her kesî/ê ne: Hêlînên zarokan ên bê pere, xwarina bê pere ya li dibistan û hêlînên zarokan. Em dixwazin hewzên soberiyên, ku malê giştî bin, ava bikin – divê her zarok bikaribe hîni soberiyê bibe. Lênerîna baş, ku xelkê xizan nake. Di dema krîza koronayê de gelek pereyên alîkariyê hatin razandin. Beriya hilbijartinan hikûmet naxwaze di derbarê vê yekê de bi axive: Piştî hilbijartinê dê diyar bibe, ka lêçûnên van yekan bi riya kêmkirin û xwemalîkirina beşên civakî werin derxistin. Em dixwazin xerca dewlemendiyê ya ji bo dewlemendiyê bêhtirî 2 mîlyon Euroyan bixin meriyetê, da ku

lêçûnên krîza koronayê fînanse bikin. Bi riya LINKEyê xurt xizmetên civakî nayên kêmkirin!

Hevgirtin ji hev nayê cudakirin

Em civakeke wisa dixwazin, ku jixwedûrxistin û kedxwarî di nav de tune bin û her kesî/ê di nav xwe de dihevine. Bi riya mafên hevpar ên ji bo her kesên li vê derê dijîn. Bi riya dewleteke sosyal a çalak û xizmetên baş ên dewletî yên ji bo her kesî/ê. Em ji cudaperestî û nijadperestiyê re dibêjin na. Meşayên ne wekhev, şansên ne wekhev ên di navbera jiyandê zilam û jinan* de, di navbera almanên rojhilat û almanên rojava de, di navbera alman û ne-almanan de zîrê didin me tevan. Her jiyandê girîng e, em tu kesî/ê li paş xwe nahêlin, her wisa ne di riya koçberiya darê zorê de. Gava siberoja zarokên me were rûxandin, ji ber ku dibistan ferqa şertên destpêkirinê yên li malên dêûbavan nikare bike hevseng, em dibêjin: Ev yek çêtir jî dibe! Em dixwazin, ku demokrasî zêdetir bi wate be, ango zêdetirî dengdana me ya çar salan carekê be. Divê demokrasî were wateya ku: ev der welatê me ye, bajarê me ye, şirketa me ye, civaka me ye. Ez li vê derê li mala xwe me, ji ber ku em li ser siberoja xwe bi hev re biryar distînin.

Em bandora dewlemend û komşîrketan a li ser siyasetê radikin

Pereyê kê zêde hebe, bandora wî/ê jî li ser siyasetê zêde heye. Komşîrketên mezin ên emlaqan bi awayekî destfireh pere bexşî CDU û FDPê kiriye û ew jî bi awayekî çalak li dijî dorbisînkirina kirêyan dixebitin. DIE LINKE serbixwe ye. Em nahêlin, ku kes me bikire. Em ji şîrketan bexş nagirin. Ji bo ku demokrasî bimeşe, em ê bexş û sponsoriya ji aliyê şîrketan ve ya ji bo partiyên qedexe bikin. Em bandora lobbyîstan aşkera dikin. Lobbya LINKEyan ew mirov in, ku ji bo adaleta civakî têdikoşin. Bi hev re em dikarin cîhan û welêt biguherînin. Em ji bo siyaseteke din têdikoşin, ji bo guherîna hikûmetê: Bi hev re em ê vî welatî bikin adilane. Bi we re. Ji bo vê yekê.

Ji ber vê yekê em dixwazin hûn di hilbijartina 26ê Îlonê ya parlamentoya federal de dengê we bidin DIE LINKEyê. Adaleta civakî, parastina avhewayê û aştî tenê bi LINKEyên xurt re pêkan e. Niha!

Kontakt:

DIE LINKE. Pateivorstand, Kleine Alexanderstraße 28, 10178 Berlin
Telefon: 030/24 00 99 99 · kontakt@die-linke.de · www.die-linke.de
V.i.S.d.P. Jörg Schindler

Eintrittserklärung

Hiermit erkläre ich,

Name, Vorname* _____

meinen Eintritt in die Partei DIE LINKE, Mitglied der Partei der Europäischen Linken (EL).

Ich bekenne mich zu den Grundsätzen des Programmes der Partei DIE LINKE, erkenne die Bundessatzung an und bin nicht Mitglied einer anderen Partei im Sinne des Parteiengesetzes.

Weitere Angaben zu meiner Person

Straße* _____

Hausnummer* _____

Geburtsdatum* _____

PLZ* _____

Ort* _____

Telefonnummer _____

Bundesland* _____

E-Mail-Adresse _____

Soziale Netzwerke (Facebook, Twitter, Instagram etc.) _____

Beruf _____

Tätig als _____

Ich war früher bereits Mitglied einer Partei im Sinne des Parteiengesetzes. Wenn ja, in welcher?* _____

Politische Interessen (Themenfelder) _____

Die Angaben werden von der Partei DIE LINKE in ihrer Bundesgeschäftsstelle und den Gliederungen entsprechend den Bestimmungen der EU-Datenschutzgrundverordnung zum Zwecke des Nachweises der Mitgliedschaftsvoraussetzung, der Nachweisführung gemäß Parteiengesetz, der statistischen Auswertung und innerparteilichen Kommunikation verarbeitet. Weitere Hinweise zur Datenverarbeitung und Ihren Rechten unter www.die-linke.de/datenschutz

Einwilligung in die parteiinterne Bekanntmachung

Ich erkläre mich damit einverstanden, dass mein Eintritt nach §2 (2) der Bundessatzung parteiöffentlich bekannt gegeben wird. Parteiöffentliche Bekanntmachung bedeutet, dass Neumitglieder zum Beispiel auf einer Mitgliederversammlung oder in einer internen Publikation des Kreisverbandes namentlich erwähnt werden.

Ort, Datum _____

Unterschrift _____

*) Pflichtfelder